

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT

KULÎLK

Kurdiska elevernas barntidning



Hejmar: 9

Sal: 1983

Zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin !



newroz
pîroz be

HEFT KARIKEN BIZINÊ

Hebû tunebû bizinek hebû. Bizinê heft karikên wê yêن piçûk hebûn. Wê ji karikên xwe pir hez dikir. Rojekê wexta ku ew here çolê ji karikên xwe ra got:



- Ez ê herim çolê û li xwarinê bigerim. -Hûn ê li mal bimînin û deriyê xwe ji kesî ra ve nekin. Haya we ji gurê birçî hebe ! Gava ew were vira, dêrî jê ra ve nekin. Ew dikare we bixapîne. Hûn wî ji dengê wî nas bikin. Dengê wî wek yê min nerm û zelañ nine.

Karikan gotin:

- Tu meraq neke dayê. Haya me ji me hebe.

Bizin çû çolê ku ji karikên xwe ra li xwarinê bigere. Bidû çûyîna wê pir wext derbaz nebû deriyê wan lê ket.


- Dêrî vekin zaroyêñ min yên delal. Ez diya we me min ji we ra xwarin aniye.



Lê karikan dengê diya xwe nas dikirin. Ew denga ne dengê diya wan bû. Fam kirin ku ew gur bû.

- Em derî ji te ra ve nakin. Tu diya me nine. Dengê diya me nerm e. Tu gur e.

Gur bazda çû dikanê û hinek kirêc kirî. Wî ew kîrêca xwar û dengê wî nerm bû wek yê bizinê.



Bazda hat dîsa li derî xist.


- Zaroyêñ delal, dêrî vekin, ez diya we me. Min ji we ra xwarin aniye.

Lê gur vê cara lepa xwe ya reş dirêjî pençerê kiribû. Wexta karikan lepa wî yê reş din gotin:

- Em dêrîji te ra venakin. Diya me lepa wê ya reş tune. Tu gur e!

Vê carê gur lezand û çû cem nanpêjê gund û ji ra got:





- Min lepa xwe êşand. Tu dikare ji xêra xwe ra hinek hevîr lê bide ?
Nanpêj hevîr li lepa wî da. Paşt ra ew bi lez çû cem aşvanê gund û jê ra got:
- Hinek ard bide ser lepa min !
Aşvan bawer kir ku gur dixwaze wî bixapîne. Ji bo wê yekê nexwast êrd li lepa gur bide. Lê gur bi hêrs ket û ji aşvan ra got:
- Ku tu hinek ard nede ser lepa min ez ê te bi-xwim !
Aşvan pir tirsîya û bi lez hinek ard derxist û li lepa gur da. Lepa wî naha bû spî wek berfê.
Vê cara bû cara sisiyan ku gur hat ber deriyê karikan û got:
- Zaroyên delal, ez diya we me. Ji min ra derî

vekin. Min xwarina xweş ji we ra ankiye.

Karikan gotin:

- Pêşiyê lepa xwe rayê me bide ku em bizaribin ka tu diya me ye.

Gur lepa xwe ya spî dirêjî pençerê kîr û rayê karikan da. Karikan wexta ew lepa spî dîn bawer kirin ku diyawan şunda vegeriyaye. Derî vekirin, lê gur bû ket hundir. Tevey bazdan û xwe veşartin. Lê gur ew dîn yek bi yek ew tevey xwarin. Tenê karikek ne dîbû. Wê xwe di binî ciyê raketinê da veşartibû. Wexta gur karik xwarin da rê çû der û li bin darekê ramediya û raket.





Wextek din şunda bizin hat malê. Derî yekiri dît.
Ket hundir li dora xwe mîze kir. Mal serlihev kî-
rî bû. Wê li karikên xwe geriya lê kesî nedî. Nav-
ê wana yek bi yek ban kir. Wexta navê ya piçûk ku
xwe veşartibû ban kir, dengek hat guhayê wê:

- Ez va me di bin cî da me.


Bizinê karika xwe ji bin cî derxist. Karikê ji
diya xwe ra bahsa gur kir.

Bizin pir bi ber xwe ket û giriya. Hustiyê xwe
xwar kir û tev karika xwe derketin der. Li bin
darekê dîn ku gur ramediyaye û rakatiye.

Bizin hat û li zikê gur mîze kir. Dît ku zikê wî dilive. Bizine di dilê xwe da got:

- Gelo ew karikên min in xwe dilivînin ?
Wê karika xwe ya piçûk ji bo derzîkê hinek dezî û meqesekê şand mal. Paşt ra wê bi meqesê zikê gur qelişand. Karikan serê xwe ji zikê gur derxistin û bidû hev yek bi yek derketin der. Tevve sax bûn. Bi saxbûna xwe gelek şabûn. Li ber serê gur govend girtin. Lê diya wan got:
- Zu herin li kevirên mezin biggerin. Em ê zikê wî tijî kevir bikin. De zû herin ku ew hîna hişar nebûye.





Tevev bazdan çûn û kevirên mezin kom kirin û zikê gur pê tijî kirin. Diya wan zikê gur dûrand. Wexta gur hişarbû, ji ber kevirên ku di zikê wî da bûn pir tî bû. Rabû ber bi bîrê da çû ku avê vexwe. Gîhîst ser bîrê û xwe ji bo avê xwar kir. Ji ber giraniya keviran gilêri bîrê bû û xendiqî. Karikên bizinê pir şabûn û tev diya xwe li dora bîrê go-vend girtin.

Kawa



Nameyek
* * * *

Ji kovara Kulîlk ra


Ez şagirtekim li dibistana Heidenstam da li
Uppsala. Hêvidar im ku hûn vê strana ha di
Kulîlkê da derxînin. Ez dixwazim ku xort û
qîzên Kurdan fêr bibin û xwe û welatê xwe
nas bikin

Samîye

Ez keçika partiyê me oy eman oy eman
Sêva sor û sipî me oy eman oy eman
Hevala azadiyê me oy eman oy eman
Xwestiya lawikê Kurd im oy eman oy eman

Çiyayê binê Kerkûkê oy eman oy eman
Xemiliye wek bûkê oy eman oy eman
Dilê min evîn hilanî oy eman oy eman
Partiya Kurdistanê oy eman oy eman

Çiyayê Berzan şîrin e oy eman oy eman
Hemî mîrg û kanî ne oy eman oy eman
Ew qas dinyayê dizane oy eman oy eman
Şoreşa Kurdistanê oy eman oy eman



ŞIRETA QIJIKE

Qijikekê ji çêlikên xwe ra got:

- Miqatê xwe bin. Çaxê meriv nêzikatiyê li we dike, xwar dibe erdê hûn bizanibin ku ew dixwaze kevir hilde û bavêje we. Miqatê xwe bin !


Çêlikê ji diya xwe ra got:

- Belkê kevir di pâşila wî da hebe, ew hîç xwari erdê nabe ?

Wê çaxê diya wan got:

- Hûn niha bê şireta min jî dikare xwe xwedî bikîn.

MIJÛLÎ



Kê xwe veşartiye ? Malikên bi deq boyax bike
ku tu bibîne kê xwe veşartiye.

LÊ GERÎN

Gelo tu dikarî peyvên ku girêdayîna wan bi hev ra
nene bibînî? Wek ku tê diyinê ji sê peyvên ku di
rêzekê dane dudu bi hev ra girêdayî ne! Gelo kî-
jan?

agir	mał	şewat
ezman	rez	tiri
çem	av	mêrg
qetran	mast	dew
derzî	şivan	şûjin
mehîn	gur	canî
dapîr	hesp	bapîr
çav	potîn	gore
dil	gurçik	dar
mange	tûrik	şîr
payîz	laçik	dîsmal
zevî	mexel	pez
dewar	gava n	zîv
tari	dûr	şev
ker	birek	kêr
kayîr	masî	beran

MIJÜLÎ



Gundi li bajêr ci ji xwe ra kiriye ?
Şunê herfan biguhere û wan rast bi-nivîse ku tu bizanibe wî ci kiriye.

SILAV LI WELATÊ MIN

Deşt û çiya û zozan
Çiçek û gulên baxan
Şîrintir in ji her can
Silav li welatê min

Rez û çiya û kanî
Gund û bajar û xanî
Bilbilên tim bi zarî
Silav li welatê min

Keç û xortin pir çeleng
Tim bi awaz û bi deng
Ala te ya renga reng
Silav li welatê min

Gulên kesk û sor û zer
Ji her ðerî dikin ðer
Li her newal û guhar
Silav li welatê min

Şehîdên ku bûn gorî
Bi xwîna xwe ya sorî
Tev karker û gundiyan
Silav li welatê min

Ji bîr nakim xweşiya te
Jin mîr û pêşmergeyên te
Bûm Brîndar ji bo te
Silav li welatê min

Brîndar



MIJÜLİ



Kêrgû ji kê direve ? Şunê kevirên nav avê da
biguherîne ku tu bizanibe kêrgû ji kê ditirse !

MIRINA DÜKANDAR

Dûkandarê dewlemend Misto çûbû heqîya xwe. Xelk diçûn û dihatin şwîna wî. Lawê wî Lezgîn thîna kört bû. Ji ber kû xort bû, nezan û naşîn dihat dîtin.

Cîranê wan Beko dixwast xapekê li Lezgîn bike. Roj_kê Beko çû şwîna Misto. Xwe kelogîrî kir û ji Lez_gîn pirsî:

- Rehmetî ne sêle bû, ji pişta me teva çû. Rehma xwedê lê be ! Hûn sax bin ! Gelo beriya ku reh_metî here heqîya xwe tu tiştek negot ?

Lezgîn tevlî ku xort bû, belê bîrwer, jîr û za_ne bû. Lesgîn bersiva xwe da:

- Na apo. Bayê min tiştek ne got. Lê ku tu tiş_tekî derheqî bayê min da zanibe, ji min ra diyar bike. Dibe ku deynekî wî em pê nizanibin hebe, yan jî qewitiyek kiribe. Malê me heye ! Em na_xwazin bayê min piştî mirina xwe navnebaş bimîne.

Beko dil xwe de şabû. Bi şermezarı got:

- Tiştek ne hêja bû. Rojekê rehmetî ji min çel mecidî xwes û min dayê. Em heval û cînarê hev bûn. Lê ku ji we re negotiye ne xem e . Bila li we xweş û helal be !

Lezgîn:

- Belê bi xwedê te anî bîra min. Rojekê bayê min ji min re got: Lezgîn kurê min, mirin heye jîn heye. Min ji hevalakî xwe çel mecidî stand. Piş-tî çend rojan hat deynê xwe xwast û hinkî deyndar bû. Sed mecidî zêde xwast, Min sedûçel mecidî dayê. Bila di bîra te da be :

Beko dît ku şuxul çiryir e, bi xwe ma' deyndarê sed mecidîyan, zû got û derket der:

- Lawo, lawo... ez bê kefen bimirim, jina min bi xelkê bimîne ku ez bayê te nasdikim.



Berxikê mamostê xwe me

Ez wek Kotan ne xerab im
Porê kesî nakşînim
Ez guh didim mamostan
Û derza xwe dixwînim

Yê li nik min Mistiko
Tim dehfan dide Kotan
Kotan jî li wî dixe
Ew guh nadin mamostan

Lê ê min ez bi aqil im
Ez li kesî naxînîm
Gava hin li hev dixin
Wan ji hev diqetînim

Ji ber vê ye mamoste
Min re dibê: Berxiko
Tu ye ê baş û zane
Ne Kotan û Mistiko

F Ceweri

NİZƏRİ

Andante

The musical notation consists of two staves of music. The first staff starts with a treble clef, a G major chord (B, D, F#), and a 6/8 time signature. The lyrics are: Ni . zə - rî bi ha ni . zə - rî bi ha, de . la . lê bl ha ni - zə . rî. The second staff continues the melody with the same key and time signature.

Nizərî bi ha nizərî bi ha,

Delalê bi ha nizərî.

Nizərî bi ha nizərî bi ha,

Delalê Romî nizərî.

Cûme nav bazara mîr,

Ehmedê Romî ha nizərî.

Nizərî bi ha nizərî,

Delalê Romî nizərî.


Derdê zeriyən dinalî,

Ehmedê Romî nizərî.

Nizərî bi ha nizərî,


Delalê Romî nizərî.

ZAROYEN HEYWANAN



Tu dizane navê wan zaroyên heywanan ci ye ?

rovî û bax



Carekê rovî diçe rastî baxekî tiriyan tê, dinê-hêre dora wî baxî sûr kirine. Hîç ıflaca rovî tûnebû bikare bikeve nava bax. Li dora bêx cû û

hat. Nihêrî qulek piçûk di sûrê da heye. Şabû, kir bikeve qulê li bextê wî ra qulzehf teng bû. Kir nekir çare pê nebû. Bihêle here heyfa wî pê tiriyan dihat, neçe jî hîç çare tunebû. Rovî metel ma, nizanibû çawa bike. Rovî bi fend bû, da aqilê xwe: sê rojan li ber devê qulê tî û birçî ma. Ji birçîbûnê rovî bû wek darek derzî. Roja çaran ew di qulê da ket hundir. Üsa xwar ku ji berê bêtir qalinbû. İcar xwest derkeve lê nikaribû derketana. Dîsa sê rojan birçî ma roja çaran ancax ji qulê derket. Derket li pişt xwe li bax nihêrî xwe xwe ra got:

- Ax baxo, baxo ! Tu baxekî rindî, tiryê te, ji te cantirin. Hema heyf e ku ez birçî ketim nava te û birçî jê derketim.

Temûrê Xelîl

ÎDAN

Li gundekî dêstê mirovek hebû. Navê wî Îdan bû. Îdan kes di ser xwe re ne didît û gelek bixwe bawer dikir. Wexta ew ji eskeriyê hatibû, şurek bi xwe re anîbû. Surê Îdan bi salan di ber mîrciyaqan de veşartî mabû. Êdî zingar girtibû.

Rojekê Idan bi berbanga sibê re rabû û şurê xwe ji ber mîrciyaqan der xist, li nava xwe şidand, hingizê xwe bi destê xwe girt, derket der û qîriya:

- Xwedêyo ! Çi belayê dinê hene bila iroj bêñ ber deriyê min.

Îdan belaya xwe di gundiyan da. Ji bo ku gun-diyan ew belê hinek aqilsivik didîtin guh nedidanê. Îdan di gund de geriya rastî Eli yê miha-cir û lawê wî hat. Eli zilamekî belengaz, reben û yextiyar bû. Wî tev lawê xwe li bênderê tolîk berev dikirin. Îdan lingê xwe li bêjinga tolîkê da, çû û hat.

Eli:

- Law Îdan tu çi dozê li min dike ? Ez mirovekî yextiyar û belengaz im.

Îdan bi hêrs lê vegerand:

- Hey lo lo. Ez Idan bim û tu li hemberî min bipeyîve.

Bi hingizê destê xwe nîvê serê Eli yê reben girt û reqîn jê anî. Serê Eli şikest. Reben li erdê bê hiş ma.

Lawê Eli dît ku bavê wî ket hema sîlanka ku pê tolîk dida hev li ber çavêن Idan da û şeqitand.

Idan ji dest hilanîn de ket û mîranî jê re nema.



PAŞE Ü ŞELAF

Rojekê Paşe ji Şelafê xwe re got:

- Ew bacanên reş ciqas xweş in !

Şelaf bersiv da:

- Ma wek bacanên reş baş, xweş, derman û lezîz tiştek heye ? Giring e ku mirov her tim wan bixwe !

Rojek din Paşe dîsa bacanên reş dixwar.

Wî ji Şelaf re got:

- Ew bacanên reş ci nexweş in ?


Şelaf bersiv da:

- Ma wek bacanên reş tiştên xirab hene ?
- Pir pîs in. Wek wan tiştên pîs tune !
- Üvî mirov wana nexwe !

Paşe got:



- Ma ne wê rojê te bacan dipesinî ? Îroj jî tu xirabiya wan dibêje ?

Şelaf got:




- Ma ez ne Şelafê bacanê reş im. Ez
Şelafê te me !

KÄCEPIRS



			B			
	1		I			
2			J			
3			i			
4			N			
5			E			
6			W			
7			R			
8			O			
9			Z			



Herin ji min re
mêjiyen zarokan
binin!



Destè xwe
nedin lawé
min !!



celadan gend zarotan
din ji gund birin.



kawa qub cem gundikan.



wi sahê xwînxar
zarokan me hemû
kuptint!!!



Gundi bala bun.



Keremke
şahê min!



şah mesti dinwe
ü keta wi di cih de yel

Pisti qendekî aisa
newzîne Dabak
destpêkir



KURD!!
Mejiyen
zarokan kînîn
bilezênen!

Hatin!
Hatin celadan
şah hatin!!

5555



Gundî li wan kom bûn

Ez ë, lawê
xwe serjê
kim !!



kawa ï celadan
birê ketin û gundiyan
ji da dî wan

Wî SATIS XWINAWAR
TUXME QELAND!



34

GEREK EM
ERİŞE BİBİN
SER ŞAH !!



16

Kawa qd diwana sah



Eava ku kawa gakûq li
serê sah xist u...




...Gundixan ji êrîq birin ser
sah û şahê xwînxar kostin!



Gelên Tranê
tevde azad.
bûn û agirê
biserketinê
dadân û bi na-
vê NEWROZ her-
Sal 21 Adarê
ev cejîn ji ahi
gelên Tranê ve
tîê pîroz kirin



Rastiya xacepirsa hejmara 8



1 X E R H A T I N

2 H I V

3 F I N D A N K

4 R E B I R

5 G A K U V I

6 C I N A W I R

7 G U H A R

8 B I S K O V

9 K U D I K

10 P E R P E R I K

11 A G I R D A D A N

12 H E L I N

www.arsivakurdi.org

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNİŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr
BIHA